

...Û heya k'engê?

... DI NAVBERA NEDESTÛRMENDÎYÊ Û AMATORÎYÊ DA!

*“Ger tiştêkî nizanibî, pê neaxive–
xelkê bi te bik'ene!”*
(Şîreta pêşîyan)

Ezîz ê Cewo

Piştî bêdengîyeke demdirêj û ne dîyar ev êdî demek e, ku dîsa nameyên hinek xwendevanên me yên zimanhez ji min r'a tên.

Nameyên wan yên berê jî bi bingeîn li ser pirsên zimên, r'astnivîsînê û r'êzimanê bûn: ewana nêr'înên xwe ji min r'a dinivîsîn, pirs dikirin, min jî bersîvên pirsên wan didan, û li ser bingeha dîtînen wan nirxandinên me pêk dihatin...

Lê, ev nameyên wan ên vê dawîyê jî hêla naver'okê û helwestê va ji yên berê cudatir bûn!

Eger mirov wana ji hêla helwestê va t'omar bike, wê derê holê, ku ew hinekî dilmayî bûne, ji ber ku *“goftûgoyên me yên li ser zimên û r'êzimana k'urdî hema-hema r'awestyane”* (yên ku di r'astîya xwe da wek p'erwerdeyekê pêk dihatin!). Û hinekan ji wan jî (Bedrêddîn ê ji Dîlokê, Belgîzer a ji Wanê, Asêya Egît a ji R'ûsîyayê), her yekê/î ji hêla xwe va, ji min pirs kiribûn. Û, eger mirov wan hemûyan bigihîne hev û wek pirsêkê şewaz bidê, evê derê holê: *“... gelo ez ji zimanzanîyê xeyîdî me, ku min berê xwe ji wê guheztye..?”*

Ev ji hêla helwestê va!

Lê hinek jî pirsne wisa didin, ku mirov li ber wana bêzar dibe. Weha, yek ji wana, Berfîn Osê ji Holandayê dinivîse: *“...Mamoste, mirov ji bêdengîya te matma dibe. Hnek tişt tîn nivîsandin, heya mirovek nîvxiwendî jî nerasti û bemantiqîya wan dibîne, hema me hiç tewir û nêrîn ji te nebihîst. Çima?*

Misal, Husein Muhemmed di meqaleyê xwe ye "DIYARKIRINA DENGÊN CUDA YÊN Ç, K, P, T" de tiştin dinivîsîne, – xwendevana hêja digazine, – behsa apostrofê dike, li ser bipîfî, bêpîfîya tipan û tiştên dinê gotinan dibêje û hinek tişt daveje meydane, ku nakeve aqilê însan...û di nav ve qelebalixê de ew dixeze di gramatika kurdi de tiştêkî taze derxîne...lê, eger mirovek hema hinek gramatik bizanbe, ewê fehm bike, ku hemû ji ne wisan e...” (<https://zimannas.wordpress.com/2015/08/14/diyarkirina-dengen-cuda-yen-c-k-p-t/>).

Mirov li vira çi dikaribû bigota?

Helbet, ev xwendevanên hêja, hemû jî, mafdar in û r'ast dibêjin!

Lêbelê, hemû r'astî jî ne t'enê ev e.

Eger mirov bi zanistî, an, hîç nebe, bi zanebûna r'êzimanekê (ya çi zimanî dibe, bila bibê!) li r'ewşa r'êzimana k'urdî ya îroyîn binihêr'e, dê bibîne, ku ew pêdivîya xwe bi r'êzimanbûnê heye, ku divê r'êziman anegorî sazîya zimên a xwezayî bê nivîsîn, ku ew divê bi qanûnên xwe yên hindur'în bê şirovekirin, ku hîç hewce jî nake, wî bi qanûnên derva, an jî bi yên zimanên biyanî binirxînin...

Lê, eger em bixwazin ç'avkanîya van pirsgirêkan bibînin – pirsê serê hemû pirsan a alafabêya k'urdî ye, hemû pirs û pirsgirêkên r'êzimana k'urdî ji vê destpê dibin!

... Û yên ku îro li ser r'êya hemû lêger'înên di warê zimên û pêşveçûnên di vî warî da dibin kelem jî, ew kevnepestî (*konservatizm/muhefezek'arî*), nedestûrmrîndî û amatorî ne, yên ku îro di vî warî da bûne desthilatdar...

Û, eger mirov hilde û t'enê bi van hemûyan va mijûl bibe, ewê bê wê wat'eyê, ku jiyana xwe vala derbaz bike...

Hema, ji vê jî bersîva wê pirsê xwendevanan dertê holê, k'a *gelo ez ji zimanzanîyê xeyîdî me, min berê xwe ji wê guheztye?*

...Lê, her çi jî hebe!..

Bi r'astî, çi "gunehê" xwe veşêrim, min bi xwe jî, ev gotara navborî, dema ew nû hatibû weşandin, xwend, û gotineke mirovekî zane hate bîra min, ê ku dibêje: "*Dema mirovekî nedestûrmed (incompetence) bi te r'a li ser pîrsekê dik'êve goftûgoyê, p'ir' xerab e, lê eger ew mirov wisa jî xwedî inîtiyatîv be, ev êdî tirajêdî ye!*" ... Ev gotin hate bîra min, û min bi xwe ji xwe r'a got, ku hîç hewce jî nake, mirov bi vê nedestûrmendîyê r'a serê xwe bêşîne... û ew nivîs danî hêlekê.

... Lêbelê, ji ber ku evê nivîsê di serê xwendevanên hêja da pîrs û t'evlihevî derxistine û dilê wan êşandye, ezê li vira her t'enê li ser hinek "şiroveyên" vê nivîsa wî biraderî ya navborî r'awestim, û bila xwendevan bi xwe bibîne, k'a ew nivîs çiqasî p'êwendîyên xwe bi r'êzimanê û zimanzanîyê r'a heye, û xudanê wê jî di pîrsên zimên û r'êzimanê da çiqasî destûrmend e.

Ji bo ku ev hemû r'ast bê têgihîştin, ezê li vira, anegorî hinek binaxeyên seretayî yên zimanzanîyê yên here sade, li ser wan herdu p'arç'eyên wê nivîsê r'awestim, ên ku xwendevan ji ber wan ewqasî matma bibûn û bala min k'aişandibûn ser wana.

Weha, p'arçeyê yekem ê nivîsa Husein Muhemmed a navborî:

"...*Bo nimûne, li hin cihan ew apostrofê (') bo diyarkirina pîfdariyê bi kar tîne (mabesta wî ez im. – E. C.) lê carinan jî di heman sernavê nivîsara xwe de apostrofê wek nîşana bêpîfîyê dixebitîne. Bo nimûne, sernavê nivîsareke wî " LÊ K'A, ÊDÎ R'ASTÎ LI K'U MA?" ye. [2] Lê her kurmancîzan dizane ku "ka" bi maneya "de ka, hele, ca" bi K-ya bipîf e, wek "kurd, Kurdistan, kar" lê "ku, kû" bi wateya "li kîjan cihî" bi K-ya bêpîf e, wek "kirin, kêr, kevir".*

Mirov dikaribû li ser vê çi bigota?

Di sêrî da bibêjim, eger mirovek bixwaze tê bigihîje, k'a ev biradera bi vê hevokê çi dixwaze bibêje, divê hinek pisporî û t'aybetmendîyên wî yên di warê xwendina nivîsên kevnar û t'evlihev da hebin, lewra ku ji hêla sazîya xwe va ev hevoka ne serer'ast e.

Û, ya dinê, mirovek, ê ku p'ir'î-hindikî zimanê k'urdî bizanibe û hinek agahîyên wî di derbarê r'êzimanekê da hebin, wê bizanibe, ku p'eyva '**ku**' bi wê wat'eyê, ya ku Husein Muhemmed bi "*li kîjan cihî*" şirove dike, di kurmancî da şûnnavê pîrsî-pêwendî ye (*relative-interrogative pronoun*), û bi r'êzimanî jî weha tê makkirin: "*Şûnnavên pîrsî-pêwendî cîyekî destnîşan dukan, bêyî ku wî nav bikin*". Û di vê p'eyvê da dengê **k**' (kh) heye, ne ku yê **k**, ji ber wê jî divê ew bi tîpa **k**' bê nivîsîn.

Lê '**ku**'-ya dinê, ya ku ew biradera dengê di wê da **k-ê bêpîf** (!) navdike, p'evgirêk e (*conjunction*), û di wê da dengê **k** heye, ne ku yê **k**' (kh)!

Û li vir ez çi dikarim bikim, eger ê ku van tiştan dinivîse, ewqasî dizane?!..

Û pîrsa dinê, ya ku, xwedêgiravî, di nivîsên xwe da ez bi xwe şaşîyê (bi zarê wî – *xeletiyan!* – E. C.) dikim: "... *Helbet vê xeletiyê ne carekê û du caran dike. Sernavê nivîseke wî ya din jî "AWIR'EK JI DERVA: PÊVAJOYÊN R'OJHILATA NAVÎN Û PIRSGIRÊKA K'URDÎ BI Ç'AVÊ ZANYARÊ R'ÛS"* [3]. Anku di peyva "k'urdî" de apostrofê wek nîşana pîfdariyê bi kar tîne ji ber ku "kurdî" bi K-ya bipîf e. Lê di heman demê de di peyva "ç'avê" de apostrofê wek nîşana bêpîfîyê dinivîse ji ber ku "çav" bi Ç-ya bêpîf e. *Vêca ku sernavên nivîsaran wiha bin, mirov biçe nav nivîsarên wî, mirov ji xeletiyên heyî nikare sereder bibe û derkeve*".

Mirov ku van gotinan dixwîne, bêyî r'ayê wî, her tiştek tê bîrê: dema ku mirovek, ê ku hîç r'eqasek a k'urdî jî nizanibe, dik'êve govendê û ç'ep û r'ast p'ê li nigên govendîyan dike (gelê me ji bo yên weha gotye: "*Hirç' û govend?!*"), û mirovên di destê wî da her bi r'êyekê dikarin nigên xwe ji wî bip'arêzin – bihêlin û ji govendê derên!

Lê ya ku ev mirovên weha, dîsa wek ku gelê me dibêje, "*daw û delingên xwe hildane jor*", k'etine govenda zimanzanîya k'urdî û van tiştan dinivîsin, dibe ku her piştî sedsalekê hinek nivîsên nû, yên di warê zimanzanîyê da pispor û destûrmend r'abin, li ser van nezanî û t'evlihevîyan lêger'înan pêk bînin, hewl bidin, têbigihîjin, k'a, ev r'ewşa hanê bingeha

xwe ji k'u digire..., û, dibe ku, heya t'êzên doktorayê jî li ser wana binivîsin, ji bo ku wan "têorîyên" van mirovan ji bo zimanzan û zimanhezan "r'avebikin"!

Piştî xwendina van gotinan, mirov nû têdigihîje, k'a ew mirov, ê ku tiştên weha dide der, heya çi r'adeyê p'êwendîya xwe bi zimên, r'êzimanê û zimanzanîyê r'a heye!

Dibe ku hinek bipirsin – çima?

Binihêr'in, eger mirovek, ê ku agahêyên wî ji *apostrofê* hebin (êdî ez di derbarê zanebûnê da nabêjim!), gelo wê tiştên weha binivîsya?

Weha, em binihêr'in, k'a *apostrof* çi ye û çi p'êwendîya wê bi *bipift-bêpift, reqî, hişkî, nermî* û tiştên dinê heye, yên ku hîç kesek nizane, k'a evan mirovana ew ji k'u p'eyda kirine û avîtine meydanê? Dibe ku ew bi xwe jî nizanin?

Divê bê zanîn, ku *apostrof* bi serê xwe tişteke e, lê ev nîşana hanê tişteki dinê ye, ya ku li ser tîpan tê danîn, ji bo ku di hinek zimanan da hinek r'engên hinek dengan ji hev bêne cudakirin!

Ji bo ku ev bê têgihîştin, em binihêr'in, k'a *apostrof* di zimanzanîyê da çawa tê nasîn û makkirin:

Apostrof (ji yewnanîya kevnar e: □π□□□□□□□□/apostrophes û tê wat'eya "ya li aliyekî va, an paşva zivir'î") – Ew nîşanek e, ya ku şewazê wê yê destpêkî tişteki mîna bêhnoka paşva zivir'î (*), berovajî bûyî ye. Lê paşê, hê dereng, ew wek nîşanaeke bi şewazê bêhnokê (*) di hinek zimanan da li ser tîpan danîne, ji bo ku hinek t'aybetîyên hinek dengan diyar bikin:

a) ji bo ku, di navên bîyanî da p'arîn-daçekan ji navên bingehîn cuda bikin: o'Brayên, d'Balzak, d'Alêma, d'Artanîan;

b) dema tîpguhêr'îyê (*transcription*) ji bo ku hinek t'aybetîyên hinek dengên pidûyî (*palatine sounds*) yên hinek zimanan bidin xuyan – d', n', p', t';

c) di hinek zimanan da ji bo p'evgirêdana di navbera dawîya tewangê û p'eyvan da (Michael's book, Dostoevsky's novel, Byron's poem), an ji bo p'evgirêdana paşdaçekên – an, – em, – emîn bi hejmaran va, ya ku hinek îro di k'urdî da jî bi k'ar tînin (4'emîn, sala 1945'an/em);

d) dema tîpguhêr'îya hinek navên erebî yên wek: Ra'id, Mes'ûd û h.w.d.; her weha, di navê Qurana pîroz da (القرآن الكريم), dema wî navî bi tîpên latînî dinivîsin – Qur'an. Ê ew ne ku ji bo "hişkkirin" an "bipifkirina" dengan e, lê ji bo wê, ku *navberdana* di nava du beşên p'eyvê da bidin xuyan, û a ew jî anegorî taybetmendîya zimanê erebî heye;

e) û, ji bilî van hemûyan, ev nîşana hanê wisa jî di tîpguhêr'îya zanistî da (*scientific transcription*) tê bik'aranîn, ji bo ku hinek t'aybetmendîyên hinek dengên zimanên cuda bidin xuyan.

Ê hê kesekî ev nîşana hanê t'enê ji bo diyarkirina "bipift" an "bêpiftiya" dengan bik'ar neanye, ya ku ji hêla vî biraderî va tê gotin.

Ê eger Husein Muhemmed, hizîyek dabûya xwe û li alfabêya k'urdî ya kîrîlî (ya Hecîyê Cindî) nihêr'îbûya, dê dîtîbûya, ku di wê da tîpa ç (çar) bi tîpa r'ûsî ya ч (чар) hatye diyarkirin, lê tîpa ç' (ç'ivîk) – bi şewazê ч' (ч'ъвик), lewra ku di r'ûsî da ne dengê ç'/ч', û ne jî tîpa wî dengî heye. Ê ev jî her t'enê anegorî prênîpekê pêk hatye: *herç'ê tîpên ku di alfabêya bingehîn (a latînî, yan a kîrîlî) da hebûne, ji xwe hebûne û weke xwe hatine nivîsîn, lê yên ku t'unebûne, bi bik'aranîna vê nîşanê tîpeke nû ji tîpa heyî sêwirandine* (her çiqas, bi îner't'sîya *kevneşopîyê* ji wê r'a *apostrof* jî bibêjin!)...

Ev, bi giştî, ji bo wê, ku r'astîya pîrsê bê zanîn!

Lê ji hêla têgihîştina sedemên p'eydabûna nivîsên weha va mirov çi dikaribû bigota?

Ji bo vana du sedemên bingehîn hene:

– ya yekem ew e, ku r'êzimana k'urdî, ji ber sedemên dîrokî yê obyêktîv û sûbyêktîv, hê jî di nava gelek pîrs û pîrsgirêkan da ye;

– ya duyem – hinek mirov, ên ku bi zimanê k'urdî va mijûl dibin, wek ku ji hinek nivîsên wan tê xuyan, hîç r'êzimanekê jî t'am û durust nizanin.

Lê, divê bê zanîn, di nava zimanzanên k'urd da wisa jî pisporên zimên ên

destûrmend hene, yê ku bêdeng û bi bêhna fireh k'arê xwe yê lêger'înî pêk tînin, û hema ev mirovana jî dê bikaribin ji bo r'onî û zelalkirina vê r'ewşa heyî ya di warê r'êzimana k'urdî da gotina xwe ya girîng bibêjin...

Û, eger em, wek net'ew, bixwazin, ku ev pirsgerêkên heyî berbi ç'areserîyê va her'in, divê wan kesên pispor, ên ku ne t'enê zimanê k'urdî dizanin, lê her weha di warê r'êzimanê û zimanzanîya giştî da pispor û xwedî gotin in, di k'omcivîneke zanistî da bînin bal hev – ew dikare konfêransek, an sîmpozîûmek be. Ji bilî van û berî van komcivînan, sazî û r'êxistinên me, yê ku di vî warî da destûrmend û xwedî erk in, dikaribûn bi dûreke (*in absentia*) li r'ex sazî an weşanekê komîsîoneke zanistî amede bikirina, û di wê da dest bi goftûgoyên li ser pirsgerêkên zimanê k'urdî pêkbanyana...

Ya dinê jî, mirov divê bi felsefî li p'eydabûna nivîsên weha binihêr'e û bikaribe di wan da hem tiştên neyînî, hem jî yê erênî bibîne... Her tiştêkî neyînî di nava xwe da û bi xwe r'a wisa jî tiştên erênî tîne, an jî r'ê li pêşîya pêşkevînan vedike...

Û, li şûna bi r'eşbînî li wan bûyeran binihêr'in, çêtir e, ku mirov bingehe p'aydabûna wan biger'e û derxe zanebûnê. Û ji bo vê jî, çêtir e, bi van hemû govtûgoyan r'a t'evayî, her kesekî me ji bo têgihîştin, r'avekirin û şirovekirina t'aybetmenîyên zimanê dê di sêrî da di warê binaxeyên zimanzanîya giştî û r'êzimanekê zanistî da perwerdeyekê bibîne. Û bi vî awahî mirovê, bê guman, bikaribe di wan da bersîvên hemû pirs p'irsgerêkên heyî yê zimanê k'urdî bibîne...

Û, ya dawîyê, ji bo wê, k'a mirov çawa dikare bi bêhna fireh û têgihîştinî li peydabûna nivîsên weha binihêr'e, ezê li vira çend r'êzên helbesta xwe ya “Beyt'-binyat”, a ku min 32 salan berê nivîsye, pêşniyarî bala xwenedevanên hêja bikim. Bila bixwînin, û, dibe ku ew r'êz ji wan r'a bibin alîk'ar, ku ew hinek bi felsefî, bi bêhna fireh li bûyarên weha binihêr'in, ên ku di jîyanê da pêk tînin, û wana ji bo xwe wat'edar bikin:

“...Wê hela hê biqewime,
ku yê neçê
şûna yê çê wê bigirin,
wê yê nezan
ser zanan da hê biqûjin...,
xêvên semme
wê hela hê
dersê bidin mervên aqil,
û aqilê ji wan “hînbîn”...
Lê tu li vir j'k'ê gazin î?
Her gunehk'ar ez û tu ne...
Belê, belê, ez û tu ne,
Ew in, em – gişk!
Ku dikarin
T'enê r'ûnin – bigazinin...”

...Vê demê ewqas!

Lê ji vir û pêva lêger'în û goftûgoyên mie yê bi xwenedevan r'a dê bidomin, emê hê dîsa vegeher'in ser pirs alfabe û r'êzimana k'urdî, bi giştî, û wisa jî ser pirs têrmînolojîya r'êzimanî û hewl bidin angorî binaxeyên zimanzanîya giştî û r'êzimana zanistî wan pirsan binirxînin...

Û ya dawîyê, ez dixwazim li vir spasîya ji bo xwenedevanên hêja dîyar bikim û ji vir û pêva jî hewl bidim, goveka giftûgoyên bi wana r'a firehtir bikim.

Ezê hertim bi bendewarî û spasdarîyeke mezin benda nameyên wan bim...

Hezîrana sala 2016-an
Pyatîgorsk/R'ûsîya